# Buwariya hestên lerizî

# Bêrî Bihar



Institut kurde de Paris

AVAGON

Institut kurde de Paris

LIV. KL. 565
01/12/2017
922 BIH BUW

# Buwariya hestên L(d)erizî

Bêrî Bihar

INSTITUT KURDE DE PARIS
BIBLIOTHÈQUE
Institut kurde de Paris

**Weşanên Avagon**
wesanenavagon@hotmail.com

ISBN
9077140034

Buwariya hestên lerizî
Bêrî Bihar

Sererastkirin
Mustefa Reşîd

Çapa yekem
Berfanbar 2005

Bergesazî, Rupelsazî
Hüseyin Polat

Çapxane
Uzman matbaacilik
uzman@uzmanislem.com

Institut kurde de Paris

**Ji bo Ava Roos**

Institut kurde de Paris

## Buwariya hestên L(d)erizî


| | |
|---|---|
| Ajda | 10 |
| Sîmav | 12 |
| Diltenik | 14 |
| Tevihev | 17 |
| Hezdikim | 19 |
| Havîn | 21 |
| Kêmasî | 23 |
| Du keçik | 24 |
| Dîmen | 27 |
| Mirovno! | 28 |
| Rêwiyê dereng | 31 |
| Awirên kutayî | 35 |
| Şop | 37 |
| Nêçîr | 41 |
| Rojên nejînî | 44 |
| Peyamek evînî | 45 |
| Heza baranê | 47 |
| Biçûkê | 48 |
| Kî hebû? | 50 |
| Ji kû heya kû | 52 |
| Neçe | 55 |
| Bêserî | 58 |
| Pisîk | 63 |
| Name | 65 |
| Bêrî | 68 |
| Avagul ê | 70 |
| îsî | 73 |
| Maç û birîn | 75 |
| I | 76 |
| II | 79 |
| III | 82 |
| Dilhejê | 84 |


Institut kurde de Paris

# NİHA TU, TU Yİ

**Mehmed Uzun**

Di van demên dawîn de, tevî her celeb aloziyê, pêşketinek heye ku ez pê gelekî kêfxweş dibim; hejmara dengên nû yên edebiyata modern a kurdî roj bi roj zêdetir dibin.

Vê havînê, gava ez li Tirkiyê bûm, min weşanxana Sî û kitabxaneyên mîna Medya ku kitabên kurdî difroşin, ziyaret kirin. Hingê min dît ku hejmara nivîskar û şahîrên me yên nû zêdetir bûne.

Tevî ku ew nav û kitabên nû ku li ser refan in, stûxwar in, zêde kes wan nabîne, naxwîne û behs nake, ew êdî hene. Hebûna wan ji her tiştî girîngtir e. Hebûn, gava yekemîn a nemiriyê ye. Sibehê rewş ê biguhere û ew nav û kitabên ku îro stûxwar in, ê di tevgera edebî de cîhê xwe yê birûmet werbigirin.

Bêrî Bihar, yek ji van navên nû yên edebiyata modern a kurdî ye. Ew şahîr e. Kitaba wê ya yekemîn a şihîran Qeşem, berî niha bi du salan derketiye û ew niha dîwaneke nû diweşîne. Min hem Qeşem xwend hem jî dîwana wê ya nû Buwariya Hestên D(l)erizî.

Şihîra kurdî di warê modernbûnê de, ez bawer im, gelekî qels e. Herçî dengên nû yên keç û jinan in, di wî warî de, şihîra nû hîn qelstir e. Jiber vê yekê ez bi dengê nû yê Bêrî Biharê kêfxweş bûm. Dengê wê bi rastî jî modern e; ew şihîra hest, coş û xemgîniyên keç û jinan dinivîse. Cîhana jinan, zarokan, pêwendiyên dê û zarokên wan, evîn, evîndarî, mijarên şihîra wê ne. Herweha jiyana rojane ya jin û zarokan ku em pirî caran, jiber aloziyên

Institut kurde de Paris

siyasî, civakî û çandî, ji bîr dikin.

Bêrî Bihar di şihîreke xwe de weha dibêje;

Tu ne xerîbê xwe yî
Niha tu, tu yî

Ew vê yeka hanê mîna jinekê, mîna dêyekê dibêje. Û bi vî şêweyê hesteke nû, dengekî nû li şihîra modern a Kurdî zêde dike.

Bêguman, Bêrî Bihar di destpêka jiyana xwe ya şahîriyê de ye. Riyeke dirêj li ber wê ye; riyeke nehêsan. Lê belê ez hêvîdar im ku ew bikaribe berdewam be û berhemên nû ku hîn bêtir kemilî ne û dewlementir in, yadîgarî me bike.

Edebiyata kurdî ya modern gelekî hewcedarî dengên nû yên xas e.

Ez bawer im, ev rêzên jêrîn nîşan dide ku eger Bêrî Bihar dewam bike, em ê bibin xwediyê dengekî nû yê modern;

Tenê lingên min dizanin ku,
Heya niha, çend gav, çend pêpêlok,
Çend dûvreşopîn kêm bûne
Ji derenca jiyana min...

Institut kurde de Paris

## Helbestên Bêrî Bihar

**Mustefa Reşîd**

Bêrî Bihar kî ye?

Bêrî Bihar jineke ciwan e, jineke Kurd e, ji nîveka welatê me ye; ji herêmeke wisa ye, ku zimanê me bi awayekî gelek avêne û zelal, mîna şîp û sîlavên welatê me, tête axaftin. Helbestvana me ji herêma Batmanê ye. Çiqas li vê herêmê zimanê me bi bedewî û reseniya xwe hatibe parastin, wisa jî dab û nerît, xwerisk û sincî, ûrf û adetên me yên kurdewarî jî hatine parastin. Lê belê di vê cîhana me de, ku her tişt pir bi lez tête guhertin, hinek ji van dab û nerîtên me bi rastiya jiyana nûjen ya sedsala bîst û yekan re naguncin. Bêriya me, helbestvana me ya çeleng, ku ji kaniya kurdewarî û niştimanperweriyê têr vexwariye, di helbestên xwe de ayîne û neynika vê jiyana me ye. Ew ji hêlekê ve gazî û hawara gelê me ji bona standina mafên xwe yên rewa û dademend û pêkanîna jiyaneke nûjen û aştiyane bi tundî tîne ziman û derdibire, û ji hêla din ve serî li ber dab û nerîtên kevnare hildide, ewên ku li ber pêkanîna jiyaneke nûjen dibin kelem û pêre li hev nakin. Wisa, Bêriya me hem bi gazin û hawar e û hem jî têkoşer û serhildêr e.

Bêrî Bihar di helbestên xwe de wêneyên gelek balkêş û rengîn diafirîne û şanî me dide; me bi xwe re dibe cîhana nîgaş û xeyalan, hin caran me dibe binê deryayên kûr, kişwerên hût û masiyan û hin caran me dibe lûtkeya çiyayên bilind, zozanên asê, warê hêlînên şahînan û fêza pezkoviyan, û me dîsa dadixe hafa gelî û newalên kûr, ber kunên maran û nêziya lanên cînewerên hov. Em bi Bêriyê re, di vê gera xwe de her dem di nava liv û tevgerê de ne,

Institut kurde de Paris

em her dem dîmenên nû dibînin û dibin xwedî serboriyên nû; mîna gera li çar kenarên welatê me, gera li nav sirûşta bedew, deşt û zozan, dehl û çiya, zevî û beyar, lat û zinar, çem û robar, gund û bajarên welatê me. Em di vê gera xwe de her gav kesên nû nasdikin, hevaltî û dostaniyan bi wan re datînin; em fêkî û sewzeyên nû dibînin û cêja wan bi me xweş tê.

Institut kurde de Paris

**Ku tu bixwazî dinyayê bişewitînî,**
**Agir berde rojnameyan...**

Institut kurde de Paris

## Ajda

Ajda yê,
Çavên xwe bigire, bigir!!
Heya nebêjim "sêv"!!!
Veneke.

Berde nava xwe wan hêsirên tûj,
Heman tiştan biavêje derve.
Heman xewnên xwe,

Dilê te kaniyeke evîniyan e
Li ber çikandinê ye,
dilop dike,
û dengê wan dilopan weke kabûsan
disîxin mêjiyê te.
Dibin dîmenên nas ji te re,
Mêjiyê te vedigere wê demê,
Ji rûniştinên çokên te di zikê te de,
Lingên te û meş ji hev û du veqetiyan,
Hev du jibîrkirin.
Direjî û ferehî mîtrokî,

Institut kurde de Paris

Milên te yên qut,
her du aliyên dîwar digihande hev.
Çavên te temaşeyî hest û ramanên te dikirin,
Dema ku ew di dîwaran da dibuhirîn û
tevî hêvîyên li asîman geriyayî dibûn.
Te dizanîbû ku tu bixwazî
dikarî kilomîtroyan ji mîtroyan çêbikî.
Gelek dem ajot lê tu rojekê
li wan mîtroyan siwar buyî
bi esmên ve hilkişiyayî,
Bavê te bahola te ya kevin bû
Giran, li ser pişta te,
Diya te xewnek bêhedar.
Niha barê te girantir e,
De hilgire, ne tirse!!!

Hilbijêre salên xwe yên ciwan,
Ji nava bahola kevin.
Bibijêre rêwîtiyên xwe yên beyar,
Ji bo xwe destpê bike ev car, tenê ji bo xwe,
Ji- bo- xwe...

Dizanî ku niha çiqas mehdekêş î,
çiqas dilê te vebûye,
Hizir dikî ku çiqas azadî.
De veke çavên xwe,
Ne tirse,
Li dû te ma dengê te yê metalîk,
Tu êdî ne xerîbê xwe yi.
Niha tu, tu yî...

Institut kurde de Paris

## Sîmav

Sîmav'ê

Dibe ku tu di ser gir û newalande,
Gav dabî bi ser kul û êşên xwe de.
û çendî ye ku tu,
          bêganeyî can û laşê xwe yî.
Te ew ji xwe kovî, yûr
          kediyê ber deriyan kirî be.

Rojên te bêbiryar, reş û navqewartî bun.
Têk diçû ew roj ku bi biryara te biza.
Tenê çend peyv û pel li dû te mabûn,
Her ku tu bûbû kulîlkeke karkerê
                    falik û avsûnan.

Dibe ku tu hê di dilê yekî de bî,
Weke reqseka rîtim li ber jibîrkirinê.
Te dizanîbû ku ji dostên te zêdetir,
Te bi bîr tînin kesên ji te dihesidîn.

Institut kurde de Paris

Şeva ku heyv tijî be, mirov nîv in.
Bi kenên xwe yên zeraya diranan,
Li dû te rêz dibin zimanên şikestî,
Bi nefesa te yi şîloz, germ dibin, dihelin.

Nexwaze êdî wan xewnên şil,
Tu ne tî yi, û ne birçî,
Dibe ku di jiyanê de hinek tişt bê şop bin
Dibe ku di jiyanê de şop li ser şopên te tune bin...
Bide du şopên xwe êdî,

Bila bes ew çavzoqên rêçên biyanî
stûxwar û rêç çilmisî bin…
tu dizanî ku tu mecalqasî,
dikarî gelek bedew bisîmî bi ser avên zelal de…
Dizanim ev car tu yê bicoş û bihêztir min hemêz bikî…
Tu karê min tune ye
Êdî bendî wê trêne me ku,
Hên ne rawestiyayî
tu yê jê xwe biavêjî ser stûyê min…

Institut kurde de Paris

## Diltenik

Çiqas tenik in dilên me,
Wisa tenik in dilên me,
Weke jiyana me,
    Weke hewayê,
        weke tozê,
Hema bi her nêrîn û gotinên yarê re
Li ber xeydê ne û dikin bişikên.

Tiştê me dixapîne,
Nêrîna me li jiyanê,
    Yên bi ronahiya mûmikan,
        Qels, jixwefedîkirî,

Ew giravên gir yên jiyana me,
    Dibin hûrgulî di çavên me de.

Lewra,
Bi tenikî û hûrguliya gozegirên berikan
hûnandin bu, armanca me
        ya jiyanê.

Institut kurde de Paris

Lewra,
Wisa tenik in dilên me,
Weke jiyana me,
Weke tozê,
Çawa ezê berhev bikim dilê xwe
Yê ji tozê
Hûrik...hûrik

Diyariya rojê ye ew ritama min
ya ji tozan hevirkirî,
Bi edaya lehengiya tarîtiyê
li benda rojên xwe ye roj,

Li benda sewaxa xwe ya ritamê.
Ax xwezî zanibûna dilê min,
Xûşk û biratiya xwe ya
bi roja bi ritame sewax kirî.

Dilek bêhay bi derencoka dilê min ve hildikişe,
Lewra,
Wisa tenik e dilê min,
Lê diqelibe,
Lê... nabîne û nabîne...

institut kurde de Paris

Dikarim dûnyayê biguhurînim bi hêza xwe yî hijdeh saliyê,
Di guhurim bi kûlîlkekê, bi peyvekê bi hêza xwe ya evîniyê...

Institut kurde de Paris

## Tevihev

Ne nêzî min e kes, weke ku tu nêzî min î,
Em b hev re radibin û rûdinên.

Bi navê te yê hergav gazî te dikim,
Ji navê te hez dikim.
Nêz, ji nêz ve dinase dilê min,
Fêrî melodiya navê te ye guhên min,
Ne weke gazîkirina navê min bixwe,
Ji min re xerîb.

Tu ew bayê herdemî
fîkandina livana te li paceka min î girtî dixe.
Neha jî ji wan gulên bexçê xwe yê şên
dirêjî min dikî.
Çavên min soraya gulan dişopînin,
Bi hilmên te yên germok re belav dibin,
şîloyiya golikên çavên min.
Çirûsên çavên tê dibin pirpirokên şeng,
di nava keskesora ramanên min de.
Dilê min her û her dipirpite bi nêrînên teyî tijî hêvî,
Tijî bêrî,
Tu bi jiyana min tije dibî,
Jiyana min bi te ditike.

Institut kurde de Paris

Siyên xezeba nin dişiklê min de li pişta deriyan veşartî,
Te ditirsînin bi her gotina min î ji te re "bixêr hatî!"
Tu baş dizanî ku ez ne ew im,
Tu hê baştir dizanî ku ez ez im, ji te zêde ne tiştek im.
Ji wê yekê dîsa li vir î tu, dîsa serê min li ser çonga te ye.

Ne nezîkî kesî yi tu, weke ku nêzî min î.
Dizanî ku hizkirina min î ji te bêpîvan e.
Dikarim îşev helbesta
herî dilbixwîn û bişewat ji te re binivêsim,
bikim diyarî û pêşgotinên hezar pirtûkan.

Ne nêzî kesî me ez, weke ku nêzî te me.
Du avên bi hevde diherikin em,
Devên me dixemilîne tiketika kenê avê.
Geh dileyizin em bi tîrêjên rojê,
û
Geh bi bêhna komikên kevzan mest dibin.
Em çar rêyên bi çar werzan ve dimeşin,
Berfîn in em,
Baran in carînan,
Teyrok in, tav in,
Weke mirin û jiyanê ne em,
Wer nêz û girêdayi hev in...

Institut kurde de Paris

## Hezdikim

Min ji gulan hezdikir,
Te ji sênc û keleman heznedikir.
Min ji çûkan hezdikir,
Te ji bûman heznedikir.
Min ji mirovan hezdikir,
Te ji îxaneta nêr û mêyan heznedikir
Min ji hevaltiyê hizdikir,
Te ji gepxur û dilxaviyan heznedikir.
Min ji evîn û evîndariyê hezdikir,
Te ji êş û janan heznedikir,
Ji hizkirinên bêhêz heznekir te.
Min ji ken hezdikir,
Te ji hestên derewîn heznedikir.

Institut kurde de Paris

Min ji te hezdikir,
Te ji malaviya min,
Min ji dilê te yê safî,
Te ji tîna germahiya rihê min,
Min ji rûyê te yî gulavîn,
Te ji dengê min î girînî,
Min ji qerf û çîrokên te,
Te ji wêneyên min,
Min ji dê û bavê te,
Te ji gora bavê min,
Min ji dil û dilovaniya te,
Te ji qencîxwaziya min,
Min ji dilê te yi zarok,
Te ji hezkirina min î ji te,
Hezdikir..
Em ji cîhêrengiyên hev hezdikin,
Em bi hev re dijîn ,
Bi hezkirin...

Institut kurde de Paris

## Havîn

Pihînekê li şikalên xwe bixe,
Wê lingên te neêşin.
Lingtazî bimeşe,
gol bi gol.
Hizrên hûrkeviran, di binê lingên te de
xişîniya bêdeng, kerr.
Kûlîlk vedidin dilopên xwêdanê li ser çermê te,
Dilopên xwêdana kedê.
Hestên te dicivin bi destên te yên şewitî,
Ewên ku bi kela tavê,
di, beroşeke bi tenî de dipijin.
Wê bêhna şewata te bê te.
Di kelekela tîrmehê, an jî ya tebaxê de.

Li benda te ne xewnên rengîn
yên di tasa dewê qerisî de
li bin dara botafê.

Institut kurde de Paris

Dinya mirov xera dike,
şewata lingên zarokan ji erda kelijî.
Li bênderan
Bê hedan
Bê sî,
Bê av,
Bê xwedî.
Ewên, weke qalikên hêkan pêşerojşikestî,
Ewên, hêvî di dawiya lîstika wan de wendayî.

Jinek,
çend jin,
derbas dibin di ber guhên gumanên berkel,
Di mêjiyên bihelkehelk li binê siyekê dirêjkirî,
Di lêvên wan de tahma axaftina bêdengî.
şîr dikele, dike bipijiqe ji pêsîrên wan.
Lê divêt ku ew pêşî zikên mêrên xwe têr bikin.
Bêhna hestên wan yên, şewitî pozê mirov digizgizîne…

*Ew bûne dîmenên herdem û hizrên havîna dijwar di binê lingên me de. Ji bo xwedê kesek tasek av nade devên wan.*
*Ewên lêvçiriyayi, panîqet, piştxûl û ji xwe bêhay an jî bihay lê dest û ling girêdayi, bimaldarî, zarok û nan…*
*Carên ku me pêlî ser kevirên ji tava havînan kelijî kir,*
*herdema ku mêjiyê me ji tava havînan kelijî, bila bên e bîrame ewên stûxwar û kedkarên jiyanê.*
*Jin:*
*Bila ji bîra me dernekevin bi her*
*hizirkirina keviran di binê lingên me de,*
*Ewên serhişk û berxwe, ber canên xwe neketî,*
*ku di pekin ji binê lingan û dîsa didin dû şopên wan…*
*Bila ji bîra me de bin bi her hilmandina jiyanê re…*

Institut kurde de Paris

## Kêmasî

Yên me bûn ew kêmasiyên,
Ku herdem para hineke din bûn.
Me hercar ew diyarî hineke din dikir.
Xwe ne didî me bi çavek,
an jî nîvmêjî.

Ji çar çavên bi çar rengan,
Bedewtir dinihêrî,
Ji tîrêjên rojê ronîtir dikir zulumatan,
Ji me tevan zîrektir bû,
Ji me tevan mêrxastir bû,
Baranê li me tevan bi hêztir lê dikir.
Ji me tevan xurttir peşkan hemêz dikir.
Ji me tevan zêdetir şil dibu,
Ji me tevan zêdetir dicemidî.
Ji me tevan zêdetir ji qelsiyan diqehirî.
Min xortek naskir îro,
Bi çavekî,
Wek deryayekê dinihêrî.

Institut kurde de Paris

## Du keçik

Ne ji vîtamînan e soraya narincokên wan.
Xwe dane bin siya paçekî, bi darek xwarûmar ve daleqiyayî.
Palên xwe dane loda qalikan,
Hestên xwe diguvêşin ji gemaran,
Weke ji gilêzê biguvêşin dendikên zebeşan.
Ava wan bi sorahî, diherike binê mevsikan.

Di goleka di dil de wan dişon
Ji hênikbûna dil, dişemirîn destên wan.
Gelek ji zevt difilitîn,
Li dora xwe digerin,
Bin av dibin,
Kûr dibin,
Ji kûrahîyan kûrtir dibin,
û
Didin du kûrahîyan...

Institut kurde de Paris

Niha,
Her yek li deverek,
Li her deverek kesek,
Her kesek bi celebekî ye di van bêbinîyan de,
Di her devekî de nîvgotinek di qiriq de xitimî,
Ji dengek bêdeng,
Di heman guhan de digerin...

Hest in,
Tev,
Ew çirûsên di nêrînan de,
û
ew  ramanên ji zanyariyên xwe fedîkirî ne,
Wan rêyên dûr û zexm în ber bi wan dixin,
Dubarekirina wan rêçên nenas,
Xwe diavêjin dîsa û dîsa ser stuyên wan
û
Dîsa li ser rêyên xeman in,
Ew hestên şermoke yên bêbersiv mayîn,
Hember wan pirsên dijwar,
Ew pirsên ji pirsîna xwe poşman.
Ewên ku li her rawestgehekê,
Bi girtina destek evîndar şa dibûn!
Ew dest,
Di Gulan û Nîsaneka bi barana hêsirên evîndaran şil bûyî,
Demek li pêjnên du keçikan jî bûbûn mêvan,
Lê!!
Nayê bîra çavên wan,
Dîtinên wan bedewiyan.
Nayê bîra pozên wan,
Ew bêhnên diljibir.
Nayê bîra guhên wan,
Bihîstina ew dengmestîyan.
Nayê bîra  wan,
Wek gerandina bayek nermik û serxweş,
Ew hilmên li ser laşên wan digeriyan.

Institut kurde de Paris

Hest in,
Dîsa bi serê rêyan ketine bêol û bêîman.
Bê dawîye gera wan,
Xuyaye ew tu car venagerin,
Venagerin ew,
Li besimiyen lêvên keçikan.
Ew lêvên ku ji hezkirina jiyane têr,
Ji têrbuna jiyanê bêpar.
Ew lêvên ku, kenên wan, di kelekela tebaxan de,
Nîsan û Gulan dibariyan,

Çi bikin, bi kû de herin?
Dawiya bivênevê ye,
Nayên derizandin, kon li wan nayê vegirtin,
Hest in!
Pêşî li wan nayê girtin...

Institut kurde de Paris

## Dîmen

Jinekê xwe bêhnteng avête de ser kursiye kî
Bişkokên îşlikê wê pekiyan yek bi yek,
Pêsîrê bi kelekel xwe avêt derve.
Lerz û pirpitandina laş,
Xwêdan, tî û birçîtî.
Lêv,
Yek li jêr yek li jor,
Hemêz kirin tî û tî serê pêsîran,
Mijiya û mijiya zarok,
Li mezinbûyinan,
                    hezkirin û germahiyan,
li xwezayi û xweşikbûnan,

Dest dihiziriyan germahiya dê,
Çavên wê li nava çavên dê digeriyan.
Tevî hev dibûn tînên wan,
Dibûne weke yek mirov û yek can.
Di çavên min de fetisî,
mixabin,
nikarîbûm hemêz bikim wê dîmenê,
Ji qeydên xwe yên dest û lingan...

Institut kurde de Paris

**Mirovno!**

Mirovno, zindîno!
Ka hûn li kû derê ne?
Bo çi çavên we bi min nakeve,
Ma nêrînên we tijî tarî ne ?
An jî hûn bixwe tarî ne ?
Bo çi çirûsên çavên we tefiyayi ne,
Ka ew çavên ku ji evîniyan mest dibûn?
Bi kû de çûne ew coşên we ?

Ez li vir im,
ka hûn li kû derê ne?
Ez dijîm û ez ê bijîm.
Lê çima hûn weke miriyan e?
Bo çi hûn destên xwe nadin min,
Ma qêy ew şel û şat bûne?
Ew hizrên we yî xurt bi kû de çûne,
Kî we wer vala û bêwate diegilîne?

Institut kurde de Paris

Li vir im ez bi tû derê ve ne çume û naçim.
Lê hûn li kû derê ne?
Bo çi olanên lingên we wer çilmisî ne,
Kî bi xeman tije kiriye rêçên wan?
Çi zû hûn fêrî jiyana bin sîyên postalên qirêj bûn,
Çi zû hûn fêrî dîlîtiyê bûn.
Çi zû diçike kaniyên we yî stiranan,
Çiqas hûn dilxwazên deyindariya gepên xav in,
Heya kengê hûnê bikaribin ji xwe xerîb,
Bi zimanekî din bijîn?

Mirovno, zindîno!
Qey dengê zarokên minî şêrîn jî na keve guhên we,
Gelo ew jî ne mirov in?
Wê çawa dilê we bar bide,
Dema qeyd di stuyên wanî zirav de hêlîn çêbike?
Çawa û çawa ew dilê we wê bar bide,
Ku dengên wanî nazik bê birandin?
An jî hûn bê dil û ceger in.
Kî xwezahiya we kire weke laşêk serjêkirî,
Bo çi hûn nexwediyên mêjû û hişên xwe ne,
Kê we li van beyar û biyaniyan bê ser û çav berdane?

Ez li vir im û bi hêrs im, ezê bi hêrs bim.
Lê ka hûn li kû derê ne?
Çûk û rawil afir didin devên çêlîkên xwe,
Çawa hûn dikarin diziya gepên devên zarokên xwe bikin?
Kî tara xêr û gunehên we dide,
Xêrên we ji kê re,
bi gunehên we re tevlîbazî dikin?
Bo çi çîrok û meselokên we derewîn in,
Çawa hûn dikarin heya roja dîwa rastiyan ji dîrokê veşêrin?
Qey carekê hûn bi devê xwe jî naşihitin,
Bûyerên çavên we dîtî,
çawa zimanê we bipaş ve badide?

Institut kurde de Paris

Li vira me ez, bi hêvî me û ezê bi hêvî bim.
Werin tevlî hêviyan bibin,
Ho mirovno!
Nizanim zîndîno an jî mirîno!
Ezê li vira bim,
li ser sînga şêrîn bijîm,
Ezê li benda nûcana bim,
bi tenê û tiqûtenê bimînin jî,
Ew qehremanî û pêre qelsiya mirovên xwe,
Ezê bigihînim guhên nûjeniyan.

Bi deverekê ve naçim ez,
û tu carî bi zanîn an jî bi nezanîn,
Nahizirim sûcdariya miriyan...

Institut kurde de Paris

## Rêwiyê dereng

Ku tu niha bi rê nekevî,
Wê li te dereng be.

Hew dikarî ji wan rêwîtiyên giranbiha,
para xwe bixwazî.
Wê çavên te li wan dîmenan bigerin.
şerê du kesan li ser kursiyekî.
Dû re ji wan re tê gotin ku, cîh gelek e.
Lê yek ji wan heya dawiya rêwîtiyê,
Kursî bi kursî digere.
Wê neyê bîra te ew dengê rêwiyan"çox şikur, çooox,
dawiya dawî em birêketin"
Hew dikarî ji wê kaniya qerisî av vexwî.
Tu yê nê bîra lawikê xwaringeha nîvê rê,
Bê xwestina te wê kesek ji te re nebêje,
"Çay"???
Îskanek bi şingeşing biavêje ser masa te.
Tê nepirsî ji xwe
"Ka îskana reben çawa neşikest? "

Wê serê te bi sindana lawik re neçe û nê,
Tê nebînî cama otobusê geh bi kef û geh jî biriqî.

Êdî tê ne diltengê çixara şifêr û alîkarên wî bî,
Wê bêhna mêrên xwêdantûj pozê te ne gizgizîne.
Nizanim tu yê çiqas bêriya bêhna lingên wan bîkî,
Lê kû neha tu bi rê nekevî
Tu yê dereng bimînî.

Institut kurde de Paris

Di camên dexmekirî de nikaribî ti wêneyan bigirî,
Nabihîsî êdî xwendina rojnameyek çeloberwarî
ya hostesekê
tevî şîrove û nêrîtên wê yi bihagiran
jî şifêr re.

Êdî di jiyana te de deh deqqe carekê
bêhna esansê nayê, ji hêla lingên te ve.
Wê destên te hew bigerin li ser wan xwelîdankên
bi kursiyan ve zengar zengar eliqî.
Şeqşeqa tizbîyan, orîn û xirxira raketîyan,
Nema bê guhên te li pişt te pistpista du kesan.

Ewqas çav nabînî tu li benda oxilmeyan zoq,
Ewqas rû nabînî tu ji dîtina leşkeran bixîroş.
Ewqas xort jî nabînî ji leşkeriyê tên, serzelût.
Tevahî bi dengek neşmî diqîrin,
bêdeng:
"Xwedêyo wê kengê ev zilim bi dawî bibe? "
Lêvên te hew nejidil û mecbûrî dikenin,
Ji leşkerên qereqolên di kuntarên çiyan de.
Hew kes dest dirêjî nava cil û alavên te dike,
Hêviya kesî wê tune be ji te,
Ka te demançe heye an jî na.
Tu yê nebînî wî lawikê leşker,
ku berevajî li nasnama te dinihêrî,
Tu yê nikaribî bikenî bi çavan,
divêt tu bêmad û lêveliqî bi.
Tu yê bêhît bimînî,
ji lihevnekirina çav û lêvên xwe.
Tu yê vê pirsê ji xwe nekî:
"Çawa sê birayên ji dayikekê ewqas
dikarin pirceleb bin, leşker, cahş û heval"

Nema zindî bibe di mêjiyê te de,
olana wî dengê nîvxew û xav.

Institut kurde de Paris

"Gelî birêzan, nîv saet navbera çay û xwarinê,
Edepxane li kêlekê ye,
Noşîcan be!"

Şingîniya perê ku te diavêt ber edepxanevan,
Dengê jina gotinnediyar:
"Otobusa we dike biçe,
keremkin siwar bin"
Piştî wî dengê qiyametî jî heger tu
bi rê nekevî wê li te dereng be!

Wê neyê te dengê alîkarê şifêr
"Bi tevahî derbasî be!"
Wê çavên te nikaribin li çav û destên nas bigerin.
Wê kesek ji te re nebêje:
"tu bixêr hatî!
Kerem ke em biçin malê."
û
Tu kes tevî bêhna te yî tirş, te hemêz nake.
Lingên te tu caran bi vî awayî nawerimin.
Tu caran wusa kêfxweşiya
dawîbûna rêwîtiyekê li te nagire.
Tu yê tu caran ewqas ne dilxwazê raketinê bî.
Divêt ku tu ji kêfan dev ji kişandina cixarê berdî.

Dibe ku tu caran nê bîra te,
An jî tu caran ji bîr nekî.
Lê!
Di dawiya rêwîtiyan de destpê dike jiyan.
Niha ku tu birê nekevî,
Tu yê derengê jiyanê bî...

Institut kurde de Paris

Di buwariya rihê xwe de, deng vedidî di kûrahiya esmên de tu, bixwe ve dibî van pêjnên min hêdî hêdî ber bi vê behrê ve, ya bêbinî; Û tijî şelq, bi berhemên Rojhilat têrdagirtî, dema vedigerin vê bêndera ku jê veqetiyane, ew pêjnên min î dewlemendin ji nû ve ji bêbiniyê ber bi te ve tên...

**Charles BAUDELAIRE**

Institut kurde de Paris

## Awirên kutayî

Te awirên xwe yên tûj kutabûn
di tîrêjên nêrînên min de
Nema dikarim şa binêrim,
Lê bijan û êş.
Te dengê min birî,
Weke olana çepikên zarokan,
Yên di pişt derencokên bi xaniyên ax ve hilkişiyayî,
de nîv veşartî,
Nabihîse kes,
Tu kes nabihîse min.

Xem nake,
Dîsa jî ez guhdar û şirîkdarê
Bêhntengiyên te me.
Ne xem e.
Tu napeyivî an jî dipeyivî,
Çi difikirî, li kû dinihêrî,
Nizanim,
Çavên te sar,
Lêvên te bê libatin.
Bê guman,
Ti mirî wisa xweşik
nikarin bifikirin û binihêrin.

Institut kurde de Paris

Çawa dikarî bibî tîrek ji kevana xwe azad?
ewqas diltijî û xembar,
de were di dilê min de biçike,
pêlî hestên minî ku bêhebuna te dikin
li nik te xwe dirêj bikin bike.

Evîniyên biharan bûn em,
Berxên li ber singa hirî bûn,
Bişîr venedibun û şîrnemij bûn em,
Na, na, nevebûnên pêsîran bûn em
Tu wisa bêlibat î û bêhêz,
Ez mam bi pêsîrekê,
Bêwate ne
û kûlînmeş in
û li ser kêlekekê ne
û xwîn dibin,
û şeraba sor dirêjî heyvê dikin
rojên min
Çavên te hêdî hêdî di
zelaltiyên xwe de winda dibin.
Çiqas diçe tarî dibî,
weke roja berçilê,
Bi xem diçî ava.

Dema dînbun û biçolanketinê ye,
Na, na debara min nayê,
Nayê sebra min,
De bike vî laşî weke serad û moxilan,
Da ku ti hizrên biyanî xwe tê de nenasin.

Bila ji te zêde kes xwedî li jiyana min dernekeve.
Ji te zêde bila ti kes, bi lêvên xwe yên şilgermî,
narincokên min î bi rengê miriyan maçî neke...

Institut kurde de Paris

## Şop

Singên her du aliyên rê
Ji nêrînên min azad dibin, lê
dikevin kemîna çavên min
bi çireçir di çirika çavên min de
têne pêçan.

Pêçana her singekî,
Mizgîniya nêzîkbûna dîtina te ye.
Bi coşa xweşiya teşopandinê
kozgehên serxweş in çavên min.

Tenê lingên min dizanin ku,
Heya niha, çend gav, çend pêpêlok,
Çend dûvreşopîn kêm bûne
ji derenca jiyana min.
Na na tenê pişta min dikare salixê,
Sitûnên ji konê jiyana min hilweşiyayî bide.

Mixabina wan dîtinên min î kesk û belek
Bitenê ew dizanin ku çav dikarin çiqas hêsiran bibarînin.
Tenê ew dizanin, êş û heycanan,
Bihevrejîna xweş û nexweşiyan,
Qenc û xirabiyan.

Institut kurde de Paris

Dibim berikeke keskesor,
Dîsa salvegera şopîniyan e,
Dîsa salvegera birîna hest û ramanan e
bi kêrên tûj.

Di her veger û dageran de,
Dibe pîneyeke hezarpîne, laşê min.

Di
za
nim

Ni
ka
rim

Bi
bê
jim

Weke werîsê dewlika devê bîrê ye dilê min
Bi her avkişandinê ve
tenik dibe,
zirav dibe,
dike biqete.
Bes ava pêjnên min î dîlên binbîr û tenê vexwo,
Destûra hişkbûna giyayên li ser banikê dilê min î ax
nede,

Ew gewher e,
Zêrîn e,
Jîn e,
Zindî ye,
Nekûj e.

Institut kurde de Paris

Di
za
nim

Ni
ka
rim

Bi
bê
jim

Kû...

Weke baranê yî tu, dixwazî têr bibarî,
Giya êdî bi barîna te sor şîn tên,
Dikarî pir bi xezeb bibarî,

Dizanim ku ev car jî nikarim
ji te re gazincên xwe bibêjim.
Wê hêviya dîtina te di nêrînên min de kevzî bibin,
Wê tim bîranînên min
pêlistokên ji heriyê bin di destên te de,
bêqîmet,
derizî...
Nizanim hê wê çend caran
van welatên bejî seranser bike,
Wê heya kengê bidahfdanên gumeguma tirênan
lê bixe dilê min.

Heya kengê bikaribim pirsa şopa te,
Ji sipî û reşikên dilşikestî bikim.
Li kîjan rawestgehê ne
hisa siya te,
olana fikandina te,
ya ji tirsa derbasbûna bi tenê di tunel û
goristanan de.

Institut kurde de Paris

Ka ne şagirtên te yên zimanê evînê,
Pêşbirkirên şagirtên min î evînxapiyan?

Di devê topan de dîl mane,
Kêf û şox, navdengî û zîrektiya Napolîon
Ew bixwe li ser hespekî qeşa girtîye
Bin siya taca wî de keç û xort hevûdû radimûsin,
Tevî awirên ramûsanên derûdorên xwe,
Weke peykerekî têne parastin ew maçikên keliyayî
di "l'Ouvre" de.
Di heman kolanên teng û tarî de,
Dihevside Napolîon ji wan maçikên hûr û gir.
Awiran dide wan û sonda kûştina wan dixo.
Ew jî bû dijminê maçan û xwîna wan rijand.
Gîşt pê lîbadibin, ser û bin dibin pêjnên min,
geh li ser û geh li binê "Eyfel"ê,
Ku tu ne li vî cihê xweş bî jî, tû yê li kû de rê bî?

Tenê qorikên min dizanin ku wê hê
çend û çend temen,
Li ser kursiyên betonrawestgehan biponijin.

Tenê hestên min î lawaz dizanin ku wê hê,
Çend caran ji bêxwedîevîniyan bicemidin
û
bicemidin...

Institut kurde de Paris

## Nêçîr

Ronahî ye,
Roj hêdî hêdî tîrêjên xwe dirêjî jiyana me dike,
Tîneke hênik digire ser dilên me.
Bi stranên çûkên cur be cur tije dibe guhên me,
Ji mêj de dest bi hizmeta hêlînên xwe
yên ber sivêrnekên xanîyên ax kirine.
Pire pira fira perên wan digûhên me de olan dide.
Dengê libata perên wan bi peyamên xêrê barkirî ne.
Nikulên xwe di gililokên porê te de radikin,
Gindorî dibin, dileyizin,
Weke zarokan kêfa cejnê bi ser wan ketîye.
Êdî
Ji xweşiya evîniyê,
tevahî laşên me amadeyî dîlanan e.
Çavên min vebûn û bi çavên te ketin
û
têrjîyan bûn.

Çi rojek xweş e,

Çi xweş e

Bo mirinê...

Institut kurde de Paris

Ew roja herî kin bû di jîyana me de,
Rojek ji roja yekemîna cejna olî.
Çawa me yê bizanîbûna ku roja xelkê yî geş.
Wê ji me re bibe reş.
Derîyê me cara yekemîn ji cûdabûnê re vebû.
Weke çav niqandine, wiha zû.
Cara yekemîn û ya dawî ye,
Vebûn û girtina deriyê jiyana me.

Destpêka adarê bû tu çûyî,
hêjmara tiliyên destekî min bû demjimêr.
Nema çavên min bi te ketin,
Dilê min, nema bi nêrînên şermoke
fesadiya evîna me dipispise guhên min.
Nema dikarim fesadiya jitehezkirina dilê xwe ji te rê bikim
Deng û mestên me nema tevlî çûkan disitirin.
Te nav û dengê min jî bi xwe re bir.
Te min bêdeng kir,
Sûcdariya jiyan û nejiyana xwe kire toq,
Bi desten gemar ve kire stûye min.
Te ez tewanbarî dilîniye kirim...
Te ez ji mafdariyê veqetand û
Hewce yê mêjiyên genî kirim.

Ew rojên adarên xweş berdewam in,
Bêhempa ne yek bi yek,
Her yek bi awakî,
Ji roja pêncan û wir de
Wisa xweşik, xweşik min dikujin.

Êdî ez perçe werçe me,
Geh li serê çîyayekî bilind,
Tîrêjên çavên te ji rojê dinêçirînim.

Institut kurde de Paris

Geh di binê behrekê de,
Li dûv jîndariyan dibezim.
Zindî me an jî dixeniqim, nizanim.

Geh li bajarekî piçûk,
Di evîneke kûr de noq dibim.

Vegera li vî bajarî bêwate ye dizanim.
Tevî heman bûyerên kû canê min dieşînin,
Bi dil û can dîsa li te digerim...

Dîsa ronahî ye,
Disa adar e,
Çi rojên xweş in,
Bo mirinê...

Li ser rêça bedewîyên rojên me,
Yên rêwiyên ber bi valahiyan ve,
Ji mêj de ketime rê,
Nêçîra tîrêjan zîrektî dixwaze,
Dizanim, dizanim,
Tu caran fêrnabim,
Tu caran fêrî tunebûna te nabim.
Dizanim…tu caran dawî ya nêçîran nayê...

Institut kurde de Paris

## Rojên nejînî

Ew rojên min î xweş,
Yên ku Xwedê ji min girtine,
Wek destek sorgulan,
Bi rêdikim ji te re.
Rêya wan duvedirêje,
wek hêsirên çavên min diherikin
dema te ji nû ve dibînin,
Cihik, cihik dibe, gul ji gul vedide,
li ser narincokên min, rêçên wan.

Ji bo ne çilmisin îsîniyên çavên te,
Bi rêdikim ji tere wan rojên xwe yên bedew,
Ewên ku fiq sipîne di ramanên min de,
Nejiyame tu caran.
Weke tu caran sanîyekî min tevli demeka te nebûbe.
Ji te ewqas xerîb û ewqas jî te dinasin.
Ew rojên min î xwelî li ser,
ku bê hebûna te bihurîn,
Te wek berfînek xwedî dikin
di nava spîtahîya jîyana xwe de.
Hezdikim ji sipîtahiya wan rojên xwe,
Ji ber ku,
Vedişêrin rêşiyên rojên berî naskirina te.

Institut kurde de Paris

## Peyamek evînî

Bi jor ve hilkişiya peyama mêrik,
Bi tîpên hêvî û êzarî mişt,
Hilweşiya mêrik çog da erdê.
Direj bûn bi jor de der du destên wî tije gazinc
Pêçiyên destên wî ji hev xeyidîn
her yek bi aliyekî ve rep bû.
Mêjiyê wî li dû şopên gûstîlokî gêj bû,
Bîstek dîn peyam
weke kaxizên hûr hûr bi ser de bariya.
Bû pelqeçîkên ji keskesoran biriqî, ketin ser ritamê,
Teqiyan bûn zarokên rûnûr û rûgeş.
Wî hemî hemêz kirin, maç kirin, bêhn kirin.
Li dû wan destên ji ritamê dirêj bûn.
Yek bi yek kişandin nava xwe.
Mêrik li dû wana xwe avête nava ritamê,
Ritam zuha bû,
Hişk bû,
Bû tofaneke tozê,
Li ser behran fûriya.

Institut kurde de Paris

Mêrik weke qafikan hişk û zuha
Li ser perçekî peyama xwe hilkişiya jor.
Dest û devekî ji qafik,
Çavên ji ritameke hişk,
Ji bêhna ritamê serxweş bû,
Hilweşiya ket ber derê bihuştê.

Keybanû nêzî şêwirdarîyê bû,
Dora wê tijî ferîşte,
Çavên spehî, birûyên hîwa,
Bejn û balên bêhempa.
Pirsî ji Xweda:
-Ew çi rewşa wî ye, çi dinivîse?
-Qeet!!! Got Xweda, evîndara xwe dixwaze.
Bersiv bide û bibêje,
-Kengê ew fêrî jiyana bi ritamê re bû,
Ew çax wê lê vegere hezkiriya wî
Ya ji ritamê...

Institut kurde de Paris

## Heza baranê

Hez dikim ji baranê,
Ew şanoya zortemaşe,
reşaya ewran,

Tune ye mebest ji bo derketina bi der ve.
Di xaniyan da mayîn bixertir e,
Kêm in ew çax bixwe vedan.

Heya destpêka ronahiyê,
Şev bi jêhatîbuna zirkêtkan dibuhure.
Di hiş de amade ye heman tişt û
Li hêviya ronahîyê ne.

Dûvpişkên rojê ne mirov,
Bi tîrêjên rojê re destpêdike,
Bîst û çar saetên bedew.
Dikuskusin çav, ji hevûdudîtinê.
Bar nadin rûyên wan nêrînek,
dostanî, bi dilxwazî, rûjenî.

Heya azana melan bêdeng û libatin.
Bi sayiya esmên û
Bi tîrêjên rojê re destpêdike,
Xwe bixwevedanên dûvpişkên rojê.

Institut kurde de Paris

## Biçûkê

Li ser meşînên kambax,
Dillêdanên min,yên qels,
Li ser qelsiyên xwe hejarî ne,
Bi dilikê te yê hur ve dijîn.

Ax, ax! dillêdana min,
Hûrika jiyanê,
Tu xweşikbiçûka heman zindiyên biçûkxweşik î,
Di rêça kutekuta dengê dilikên xwede,
Di delaliya biçûkahiyan de
dikarî min bibînî,
De ne pewîste tu pir bigerî,
Ne bêje bitenê me ez û bê
şirîkim di binê vê axa sar de,
çavên xwe veke ji min re,
Netirse ji siya min,
Ez im ez,
Ez im têm,
Ax eman,dillêdana min,
Ax ax dilsewiya min,
Êz im ew,
Dilekî rêk û pêk ber bi hejariya te ve tê.

Institut kurde de Paris

Mêzeke li çavên xwe,
Li zifiriyê,
Berhev bike wan rêwiyên, şevên şahiyan.
Ew rêwiyên çewterê ,
Ji heman pejirandinên hêja, bêpar.
Emrê min e ew rebenok û lawaz.
Ax eman,
Ax ax emirkurta min,
Ew rêwî ber bi te ve tê,
Dizanim ku gelek najo,
Lêdana bihev re ya dilên me.

Ax ax rêevîna min,
Nikarim bê te bijîm,
Temenekî dirêj ber bi kurtahiya temenê te ve tê.

Institut kurde de Paris

## Kî hebû?

Kesên ku hebûn, tev çûn,
Ne tenê bi laşên xwe ji me veqetiyan,
Siyên wan jî dane dû laşên wan,
Weke werîsan dûvedirêj bûn, reş bûn, zirav bûn,
Dev ji me berdan û çûn.

Wê hên bersivên gazinên me bidan a,
Hên me yê ew,
ji bo meremoziyên wana bibexşandana,
û hên destên me li valahiyan li wan digeriyan,
Rêçên germiyên pêjnên wan nema gazî me dikin,
Pêjnên me ji pêjnên wan sêwî man.

Nepeniyên xwe di nepeniyên me de veşartin,
Awazên xwe yên nebihîstî,
Rûpoşên xwe yî cûr be cûr,
binax kirin.

Institut kurde de Paris

Wanên ku di bin de dikeniyan di cihê girî de,
Carînan jî digiriyan di cihê ken de.
Kesekî nizanî bu ka çi diramin û çi dixwazin.
Hezkirinên xwe digotin dema ku xwestxapandinên
Wan xwe ji hiş berdidan ser rûyên wan.
laşên wan di asaniyan de bûn bi rûpoşan.

Ewên ku hebûn,
Bi tiştên xwe yên hez an jî îman jê çûyî ve,
Qehr û gazincên xwe,
Çêr û pêçariyên xwe,
Giraniya nerîtên xwe,
Xwêdana xwe ya ku mitêl pe avdidan
                    di şevên qels de,
kirin bar,
        dane pişta me
                    û
                    çûn...

Kî hebû?
Ewên ku hebûn,
Tev çûn,
Dilêşî û kovanên xwe,
Carcarinan hêsirên xwe,
Tevlî neheqiyên ku
            Bi porên me ve hûnandî bûn.
Kirin gilokên xeman û
Bi deriyê me ve daleqandin,
Ew hestên firoke, ji çûkan re kirin bar,
Bûne xewn û xeyal,
Serê sibekê ji kefa destên me firiyan
                                û çûn.

Kesên ku hebûn,
Ew ji xwe weke tune bûn...

Institut kurde de Paris

## Ji kû heya kû

Ka binihêre !
Ev rê...
Ev rê rêya me ye

Bûye lûsa rawil û sewalan,
Ji fêkîyên nêrît û janên me,
Ji hêvî û ramanên me doşekên sitûr girêdane
Li ser wan mar û dûvpişkan pal dane,
Dûyê qelûnên wan bûne ewrên reşgiran li ser baxên me.
Li benda barîna herî bi xişm me teyroka wan î xezeban.

Ka binihêre !
Ev rê...
Ev rê rêya me ye

Ji peşkên barana şerê azadîxwaziya me,
Pêlên dijwar yên neyartiyê dizên,
Ji ava zelal vedixwin dostên me!!!
Ew xwarinxurên demekî sifra me ya dewlemendiyê
Şaredariya xwe avakirine li ser qûlpikên têrxwarinê.

Institut kurde de Paris

Ka binihêre !
Tu nas dikî?
Ev rê rêya me bû

Rêya min û te,
Bûye korç û newal,
Di yek ji wan korçan de veşartî me ez,
Bûne delavokên hûrik di korçan de hestên me,
Weke sêwîstêrkan li hev civîyane.
Dilerizin...

Çawa be jî, ev rê rêya me bû,
Xirab be jî ezê wê biparêzim
bi xwezaya xwe ya jinantiyê.
Çawa be jî ked û xwêdana me rijîyayê.
Bixwazî dîsa were, hewl bide û bimeşe,
Ezê nas bikim pêlkirina te,
Nas bikim ezê,
rêçên te yên nermik
li ser çavên xwe...

Institut kurde de Paris

Di romanan de lehengekî dûblorerzan,
Di pirtûkan de helbesteke hebûn negirîng,
Di band û cd-yan de straneke valahiyan tijî dike,
Di civînan de seriyekî hejmar zêde dike,
Hema ji bo te ez zêdebûna tîrajan im.

Institut kurde de Paris

## Neçe

Min got neçe ji te re,
Nebe bi xwe re kêf û nalînên min.
Tu nikarî hilgirî, ez te nas dikim,
Tu zu ditengizî, nikarî li hember pêlan,
Nikarî li hember lehiya hestan, direvî.
Min got ji te re, nebe bixwe re,
wan bargiraniyan,
Wê ew bibin tacek ji berfa hemdemîn,
Xwe bidin serê te û tê de wê qeşa bigirin hestên min.
Agirî,
min got ji te re,
tu ne berenberî Agirî yî.
Xwe ewqas mezin,
zirav û
dirêj neke.
Bikî nekî serê te nagihe ewran.
Divêt tu li ber û pêşiya xwe binihêre.
Kesek silavek jî li te nake,
Heger ne evîniya min bî ji xwe tu xuya nakî.
Tu di kirasê min de yî dema mirov ji te re dikenin.
Tu yê di kadîna kulên min de rakevî,
Tune cîh û livîn ji te re.
Tu yê têkevî tora wan zindî an jî miriyên zagonan,
Wê te bêxwedî, perîşan û tenê bikin.
Neçe min got ji te re
û
binpê neke van bîranînên me yên rengîn.

Institut kurde de Paris

Ewên ku her yek wê bibûna zarokeke rûgeş ji me re.
Tewanbariyan nede pişta xwe min got,
Nebe jankujê janvejînan.

Ji henga ku tu ji kirasê min derketî yî.
Dizanim, li te sar e,
Tu dicemidî, belkî jî diqerisî,
Dixwazim dîsa çakêtê xwe biavêjim ser milên te.
Te biparêzim,
germ bikim,
bi hilmên xwe yên şîloz.

Min got neçe,
tu yê bêriya min bikî.
Tiştek pîs e tu zanî bêrîkirina min.

Kirasê min jî stûxwar e bêyi te,
Nema tê şûştin, ûtîkirin.
Reng û rû jê çûye, qermiçiye.
Min dizanîbû ku tu herî,
ezê bi tenêbûna xwe vebim.
Nû bi rengê rûyê xwe hisiyam.
Diran…
Diranên min zer, neynûkên min dirêj,
Çavên min tijî şîqal in.
Min nizanîbu ku heya neha neynik,
Dixapînin çavên min.
Nemaye xweşî û aramî,
Dicemidim,
li min sar e,
Li germahiya te digere laşê min.
Di tunebûna te de li wateyan digere,
Her beyarî û xizanî dertên, ji xewnên şevan
Balîvê min nema weke pêmbû
lê weke guran tê rûyê min,

Institut kurde de Paris

Nema laşê min germ dibe bi wê mitêla hirî,
Nikarim li xwe deynim, zor e
lê
Yê ku bêwate bû ez bûm li cem te.

Min got ji te re neçe,
Ezê bêriya te bikim, ku tu herî,
Nikarim li xwe deynim, zor e,
Lê...Tiştek gelek pîs e bêriya te kirin...

Institut kurde de Paris

## Bêserî

Navê mebesta jiyana xwe deyne,
Weke navê romanek nû venasîn,
An jî navê helbesteke  nebihîstî,
Ew navê ku roman, helbest,
Qada qehremaniyê jê bigirin.

Wek zarokek ku nû ji dayîk re bûye,
Hên tu kesî bi nêrînên xwe yên qirêj,
Siya xwe xwar nekiriye ser rûyê ciwan.
Ew navê di hişê te de,
Hên tu kes pê nehisiyaye.
Bi coş û heycana vî navî bijî,
Tije û sertije, têr û sertêra xwe.
Bê sînor, bê binî...

Navê xwe li behrekê bike,
Bi heman jîndarên wê re bijî,
Bi dadmendî, bê çelwerî, bê berberî.
Reşik, sipîk, gewrik...
Te çi jê ye…
Tenê tu bi kesî ve nebarîne,
Miqayetê reş û gewriyên xwe be.
Bijî li devreyî wan nepeniyên ku sedemên hebûna te ne.

Institut kurde de Paris

Çi qas sînor danîn ji me re,
Sînorên dirîreş, ewên ku,
Di valahiyên wan de di pirpitî jiyanên me
Em dest û nig girêdayî man li ber çerxa qederê,
Bi nazdarî ew xwedî kirin,
Weke zarokên li ber sîngan,
Ewên ku dîn dibin li ser dayîk û bavên me.

Ne dibistanan bihizre,
Ne jî ciwanên di şer de.
Li behran temaşe bike, li tirsên,
Di nava Rojhilat de,
Ewên ku mirina wan nêzîk.
Di nava temaşeyande jibîrbike,
Fehlên, kevaneyên di Bakûr û Başûr de.

Bi herdu destên xwe, bigire bi serê xwe.
Weke tu delalê dilê xwe bi evîniyeke xav, binax bikî.
Di nava axa îsîniyên stêrkan de veşêre serê xwe,
Wek jiyanên hezarpirtûk,
Belav bibe li nava xwezayê.
û
Li werselên xwe bigere, dîsa bi coş wan berhev bike.

Li ser stêrek dirêj bibe li tunehîyê mêzeke,
Nigên xwe berjêr bike, ewran li hev bixe.
Li vî alî geh li wî alî.
Destên xwe dirêjî şaxên daran bike,
Mizde serê çûkên li bendafir.
Bihelisîne dijminahiya li hember çûkan yên zaroktiya xwe.
Li ewrên barangiran bimije,
Bi tîna tîrmehê vexwe baranê.
Dest bavêje ewrên belek,
Hizir bike wan wekî sipîtahî û nermiya sîngên nûgihîştî.

Institut kurde de Paris

Di nava gewriyên ewran de xuyaye!
Wa ye ez nêzîk dibim!
Wa ye nêzîkî min dibin!
Behra ku di çavên min de wekî geliyekî xuyayî.
Dibînim, nêzîk dibim!!!
Wa ye dibînim ew werselên min ku ji zû ve ji min cihê bûyî.
Wa ye wek bihêza tîrojka roniyê ber bi min ve tên.

Çiqas hêja û dewlemend e axa ku Xweda ez li ser dame.
Çiqas mezin dibe mirov bi mezinbûna xwe,
Çiqas bilind dibe mirov bi bilindbûna xwe.
Ew çax tê bîra mirov,
Çend peyvan dizanin em?
Sed, du sed!!!
Bi çend peyvan em dikarin pesnan bidin?
Pesna dîtinên pesingiran.

Dixwazim jibîr bikim,
Wan rêzikên genî, rist û zagonan.
Dizwazim tirs bimirin di mêjiyê min de.
Çi dizwazim dizanî?
Latekî gir bi lingên xwe ve girêdayî, herî giran,
Rasterast dirêjî binê behrekê bibim.
Bêhn bikim masihûrikan,
Ramûsim, çav, poz û devên wan.
Kevzî bibim,
Bila,
Bibim ez stara wan.
Ji ber masiyên dijwar xwe di paşila min de biparêzin.
Bibiriqim wek gewherên bihagiran.
Çend kes wek TITANIK bi ser min ve vebin.
Min Venasin...
Gelek kes ji romantizma jiyana min,
Germ bibin,
Di mêjiyê xwe de bibin şirîkê wê cihana bêsînor,
Hayîdarê reşik, sipîk û gewrikan bin.

Institut kurde de Paris

Li ser lêvên we besimînek,
Di çavên we de çirûsên hêvîdar,
Rengên çavên we wê strana min distêrin.
Mijangên we pê re direqisin.
Ji tirsên we, yên mirî xwiya ye,
Hûn jî dixwazin,
Belê, belê!
Hûn jî dixwazin wekî min bijîn...

Institut kurde de Paris

Dilpiçûk, hêvîmezin bû zaroktiya min,
kî ji min girt nizanim, nayê bîra min...

Institut kurde de Paris

## Pisîk

Sedema te ye çi hatiye serê min.
Te ber bi dawiyan ve bir hezkirinên min,
Weke di ritamê de bimeşî,
Çelpeçelp dike devê te,
Kêzek têde digevize,
Piştî bi jehrketina xwarina masîyên bi te re,
Nema dixwim,
Weke guran dibînim, masîxuran!!!

Sedema te ez nebûme peykervan,
Te yê her şev saet li diwanzda ew bikoliya û pêde bimîziya.
Herdem te rûyê xwe yê qermiçî diçikande çavên min,
Nema hez dikim ji peykeran,
Ew di şiklê tede ne dema nêrînan.
Xwe li min dipêçin weke extepotan.

Niha cîhangerekî bê biha bûm,
Heger te mêjiyê min teng nekira
û
Nêrînên min ne qusandana.
Nema hez dikim ji hespan,
Berçavkên we weke hev in,
Derî digirin li hêvî û tikayan.

Institut kurde de Paris

Li benda zikatekê bûm ji hezkirinên te,
Agir bi bêndera evînê ket bi nêrînên te yên tûj,
Ne binbênder lê tenekî jî ji min re nema,
Ji komên herî bilind,
yên hêviyan,
Li gund, bajar û heya çiyan...

Çavên te bi ronî bin,
Di dawiyê de te kuşt xwezahiya min,
Ipala û tazî man hestên min,
Sedema te ye çi hatiye serê min,
De here... derkeve ji dilê min,
Here nava hevalên xwe yên pisîk,
De here, here bê rawestan,
Here welatê xwe yê pisîkîskan...

Institut kurde de Paris

## Name

*Nameya Şêrgo*
*jî Çapemeniya Cîhanê re*

Ez birçî me
Hûn têr in.

Nehatiye bihîstin hên axeke wer dewlemend, dîrokî û fêrisî,
Berê tu çiyayan wer bi rûmetî ne bi jor ve ye,
Ji çiyayan dayîk tenê li ser vê axê çêdibin,
Dayîkên ku dikarin hezar zarokan bi hev re
xwedî bikin. Wer jîr in, hunerhûnên jînê ne,
Dikarin ji tunebunê hebin, ji hebûnê tine bibin.
Mayîn…
    ewqas ne werselekî ji jiyana tu kesî ye,

Ez li vira digirîm,
Lê hûn devligaz dikenin.

Kî dikare hêsirên xwe bi salan weke min, bi nava xwe de biherikîne?

Institut kurde de Paris

Kesek nikare weke me di nava xwe de biteqe. Dîsa bêpejn bimîne
Dîsa kî dikare ewqas weke min diltije hezbike,
Di dawiyê de
Mil tijî hemêz li dijminê tûnekirina riha xwe binêre?
Kî dikare weke me ewqas sûcdariyan bibexşîne?

Ez dîsa dibexşînim,
Lê dawiya sûcdariyên we nayê.

Lingên min, dikarin çend giravan bigihînin hevûdu,
û hilgirin ji vî serî heya serî yê din birîndarên jînê.
Lingên min nayên zevtgirtin,
Beza şopên lingên din bêhêz in li dû wan.
Ew baş dizanin ku li ku derê veşartîne MAYÎN,
Ewên ku her carê weke kêran di nîvî de dibirin hêviyên min.

Ez dikulim,
Çawa hûn dikarin bimeşin?

Ji bo jîneke serbixwe, jîr û têr ,
Bo rojên xweş û geştir hildigirim li ser
milên xwe vê dinya pîr.
We jî pê re xwedî dikim
bi nazdarî li ser dilê xwe.

Gerek jiyaneke bi rumet weke
pêşerojek para min be jî.

Ez dimirim,
Hûn li ser laşê min dijîn.

Heman rengên biharê xwe dane ser rûyê min
Çûk difikin li ser şaxên min î fêkîbar,
Çavên we têr nabin, ne ji nêrînê
û ne jî ji xwarinê.

Institut kurde de Paris

Ez diçilmisim,
Lê geşa we çav diqemişînin.

Ti zarok weke min ne şilfîtazi ye,
û weke min ne awarteyê tevî jîna ba û bahozan e.
Ti zarok nikarin weke min hember tî û birçîtiyê.
Kî dikare weke min, di bin siya çavên nêrxayîn
û tewanbar de çavtêr bijî?

Ez birçî me,
Hûn têr in.

Teqandina we ji têrbunê,
Ya min î helperînî ye.

*Têbinî:*
*Ev nama şagirtê min Şêrgo ye.*
*Fikr û raman yên wî ne.*
*Tenê min lê guhdarî kiriye.*
*Ew cînarê gelek zarokên Kurd ku ji*
*ber şewata gund û malên xwe koçî*
*bin bend û siya bajarê Amed bûne ye.*
*Tême çavên wî ku hên jî birçî ne*
*û weke çavên herî têr û birûmet dinihêrin.*
*Wî zimanê xweşik ku tim polîsan bi*
*Kurdî dibersivand.*
*Bi hêviya hevdudîtinê, di cejna şekiran de...*

Institut kurde de Paris

## Bêrî

Ne giran e hilgirtina êş û kulên min,
Bi hêsanî dikarim li hember mij û moranan,
Ne zor e hemêzkirina borana berfan,
Tiştê pişta min xul dike, ne bitenê mayîn û xerîbîye.

Bêriya zarokên xwe yên kenşekircejn dikim.

Niha her yek di kolaneke tarî de li du nanê xwe dibeze,
Aliyekî Şêxo daleqiya ye,
Bi sindoqa boyaxa şikalan ve,
Stûyê Şêrgo bi sinîya şîraniyan ve xwar bûye,
Qîreqîra Ferhad e li ber deriyê xwaringehekê,
Mezlûm dikişe çekçekan di bin siya awirên pîremêrekî de,
Xwêdana laşên wan tevî hev dibe,
Dema bi hev re rûdinin ser pîvaz û nan.
Tiştê min dil dibe ne xizanî û hejarî ye,

Bêriya wan dilên piçûk û
têde hêviyên mezin dikim.

Sibeha min bi rûgeşiya wan re dibû ronahî,
Dengê wanî zirav û neşmî bû ez ji rewşa tengijî
Ya derûnî azad dikirim.

Institut Kurde de Paris

Ne min,
Lê wana ez perwerdeyî dijderketinan dikirim.
Ne nexweşî û dilêşî ye tengasiya min,

Bêriya zarokên xwe yên çavtîrêjroj dikim.

Di heman wêneyan de tiliyên van "V" li jor,
Bi kenekî dirangewher, bi çavên hûrik,
Hêjî heryek peykerekî giranbiha ye,
Di hêlîna çavên min de xwedîkirî,
Di quncikê herî germ yê dilê min de kedîkirî ne,
Bîranînên wan, bêhn û hilmên wan.
Di pênûsa min de digerin li dever,cîh û war,
Tiştê min xemgîn dike ne demsalên hêjar û ne payîz e,
Weke hêviyên ji salê zêde mayî, bin bênder.
Ne xem e hilweşîna pelên ji daran,

Bêriya zarokên xwe yên rûbihar dikim.

Institut kurde de Paris

## Avagul ê

Çawa tu yê bizanibî ku,
Dema ez bi mirinê hisiyam,
Jiyan li min zor hat?
Giran bu heman tişt li ser milên min.
Giraniya te û ya jiyanê.

dijîm,
Ku bibêjim ji bo te,
Bawer bike,
            Ne derew e.
Mirin li min zor hat,
Kengê libat û zindîbûna te tevî jiyana min bû,
Bi qolincên te re ez bi mirinê ve vebûm.
Min digot:
"tu yê werî lê ez ê herim"

Dema ez digiriyam, tu bêdeng bûyî,
Dema tu digiriyayî, ez bêdeng bûm.
Dema dillêdanên te qels dibûn,
Yên min ew kedî dikirin,
Hewldidan û bi hev re lêdidan,
Êşên me hevdu diqedandin.
Bi dorê êş digirte zikên me.

Institut kurde de Paris

Berî çavvekirina te, tu tune û nexuyayî bûyî.
Lê
Min qet xerîbiya te nekir.
Weke tu herdem bi min re bûyî, herdem hebûyî.
"Cana min, Kulîlka min, xezala min"
peyvên herî nas, dihatin guhên min.
Weke ku min herdem ji dil û can,
Te li ber sînga xwe mijandî be.
Weke ku herdem, ji kelekela mijandinê
Xwêdana me tevî hev bûbe û
tevî hev ketibe xewa şêrîn.

Kengê ez bi mirinê hisiyam,
Jiyanê zor da min.
Ku bibêjim ji bo te,
Bawer bike,
Ne derew e.

Nema bêkêf û bi gazinc im ji şevîniyan,
Ne gilîkarê zêdekarkir im.
Ber bi şîyarbûna te yî ji xewê,
tevî kenê bêhempa ve,
Bi hezkirin ber bi te ve têm.
Bi te ez bêhnfereh, rûken û jîntijî me.
Tu caran kesek ewqas ne ezîz bûye li ber dilê min.

Ji henga ku bi ser jiyanê vebûme,
Mirin li min zor tê,
Tu bûyî ew xemla jiyana min
ku ez sedan sala hevî bum.
Tu buyî ew werselê min,
Ku heya niha
Kêmasî û valahiyek mezin bû di laşê min de.

Rojên minî reş û sipî,
Rengîn bûn bi hatina te.

Institut kurde de Paris

Bi kêfxweşî min her roj rengek cil li te kirin.
Reng li ser tena te bi xwe ve tên û
temamî rengê xwe dibin.
Bi derketina diranên te re,
Kulîlkên sipî vekirin li ser rûyê min.
Weke kû bêne çilmisandin, diêşiyan,
Dema êşa pidûyên te ji dewsa diranan.

Bi lîstika wan tiliyên te yên hûrik li ser rûyê min,
re şiyar dibim her sibe

Weke devmasîkek bûyî bi wî kenê xwe yê xweşik,
diranên te weke gewheran diîsîn,
Tiştek weke wan rû û lêvên te li hev nayê.

Roj bi roj mezin dibî,
Roj bi roj piçûk dibim.
Winda ye piçûktiya min di mezinbûyîna te de.
Ez bi kêfxweşî dijîm di hindirê te de.

Kengê ez bi jiyanê hisiyam,
Min hizrî te kir.
Tu niha dimeşî, peyvan dibêjî,
Ji erd û esmên bihatir e peyva te ya "mam-ma, dad-da"
û reqsa te, û çavên te, û serê te ye zelût,
Hêja ye û hêja ye.
Tu berhema bihagiran, bêhempa yî
Di jiyana min de.
Min çêtir tiştek nîne...
Ez dijîm,
Ku bibêjim ji bo te,
Bawer bike… Ne derew e...

Institut kurde de Paris

**Îsî**

Stêra piçûk,
Çiqas xweşik diîsî,
Çend stêr diîsin li dora te?
Tije dibe bi roj bi ronahiya rojê,
Dibiriqî di şevtariyan de,
Diîsî li ser serê erdê.

Tenê li welatê rojê tu
nîşangeha sibehek xweş û ronahî yî.
Li şevên vî welatî tu,
Biîsî, bibiriqî, biçirûsî jî,
Sibe,
Dîsa bi baranên ronahiya derengmayîn dest pê dike.
Li vî welatî,
Ne tengezarên hev in,
Şevînî,
tarîtî,
stêr,
sibe û ronahî
heya roj jî ne tengezarê tarîtiyê ye
di dema tîrêjdayinê de.
Bi bêhnek fereh li benda meşîna reşayiya ye.

Institut kurde de Paris

Stêra piçûk,
Gelo çend stêr diîsin li dora te ?
Heye ku hûn ji çirisandinê aciz bibin?
Çend stêrên aciz hene li dora te?

Ji bo çi tu ji jorê hatî xwarê?
Gelo tu yê çawa seredariya,
Mijokên çirûsan bikî?
Qey te dil heye destûra mijandina çirûsên xwe bidî.

Tu yê bêriya hevalên xwe û leyîstikên we yên îseîsî nekî?
Gelo tu yê ji geremola xwarê aciz nebî?

Here stêrê, here jor,
Ji nava îsiniyên bingemar here,
Here piçûkê here,
Bi jor ve, bi rojên xweşdîwa ve
û ji xwe,
Li xwarê tu xêr nemaye...

Institut kurde de Paris

## Maç û birîn

Çiqas dereng pê hisiyam,
Bi vê baweriyê derbasî bû
Nîvê temenê min.
Heya ku bihezar maçan sax nebû
birîna min ya dil…
Xwezî bi mezin bûyînê re piçûk biman a,
Xwezî dîsa bi maçên dayika min sax bi bû na
şikestina serê min,
birînên çokên min…
Xwezî dîsa birîndarê lîstikên xwe yî zaroktiyê bû ma,
Xwezî lîstikên min paqij û zarok biman a…

Institut kurde de Paris

## I

Gerîn û birûsknameyan naxwazim,
Maçîkirinên dûr û nejidil ne pêwîst in,
Teseliya tililiyan deyax nakim bi serê xwe de,
Çiqas hûn di dilê xwe de min rêwiyê gorê bikin jî,
Ez ber bi jiyanek nû ve diçim.
Belkî xweş, belkî jî nexweş be,
Lê ez narim mirinê,
Dema ku we ez bi darê zorê
bi kesek ku ez nexwazim re mar kirim
Wê carê, hûn dikarin bi sûcdariya xwe de bigirîn.
Wê carê, tewanbariya nejiyana min
bila bibe ben û qeyd di stûyê we de,
bê badan û bêbêhn bimînin ji gunehê min.
Wê carê,
Ji bilî xwîşk û diya min,
Bila kes ji bo min xwe bi zor negirîne.

Ji xwe giran e laşê min,
Nema dikare hilgire wan
gotinên bargiran, hişê min

Potik, paçik û qirçikan
naxwazim li ser serê xwe.
Zarokên kûrî naxwazim di dawa xwe de.
Bibihizin ku divê ez zarok,
an jî yê kûrî nexwazim,
Bibihîsin ku ez jîn û xelasiya xwe
naxim destên hinekî dinan.
Bila ti jin bi çavên tijî
zehmetiya şeva yekemîn li min nenihêre,

Institut kurde de Paris

Êdî xesû, xezûr, diş û hêwiyan li min nekin kom.
Pêwîstiya bihevrejîna wan bûye dîrok,
Pêlîstok û sedemên derew û meqsedê kesî nînim.
Ji xwe zêde hêviyan ji min nekin.
Ez li dû civîna hêviyên xwe me,
Cîhgirtina we, di jiyana min î nû de,
wê dem biajo.

Di quncikên odeyan de
fesadiya reng û rûyê min,
ser û guhên min nekin.
Dîlana min ne feraşgeha hîsabên we yên bi hev re ye,
Ji xwe re veşêrin ew zagonên xwe yên bi kufik û genî.
Ji xwe zêde xwir xuyan nekin,
Bê ser û çav xwe neavêjin ser xwarin û vexwarinan.
Zêdeyî hêza xwe, xwe li erdê nexin.
Feqîriya xwe weke dewlemendiyek împeretorî
bi ser min de nereşînin.

Kesek bila nepirse "KÎ ZAVA, KÎ ZAVA????"
û bila kesek nebersivîne, ji xwe
hûn tev dizanin ku lehengê vê şevê kî ye.
Jibîr nekin,
Ku ez îşev ne bûk bûma wê zava jî tune bûna!
Hûnê îşev bê leheng bimana

Ewqas li haş neherikînin keda me,
Êw cêrik an jî sewîlê gulbigul neqişandî,
Ku hêviyên çend keçikan tê de ajdaye.
Bila nebe nîşangeha hêza nav milên min.
Dilê min bar nade ku wê
huner û keda wan
bikim perçe û bixim binê lingên we.

Institut kurde de Paris

Bila deng dengê we be, rû rûyê we be.
Bi çavên xayîn û hevsidî, xêrnexwaz
Nenêrin li govenda dirêj.
Bi gelacî keçikan ji bav û birên xwe re nexin eyar.
Wana bi xapandin nexin milên xortan û devên xelkê
Jiyanên ciwan payîmal nekin.
Hezkirina we ne ji dilê we bê,
Ne ji kûrahiya hestên we bên çepikên we,
Ji kerema xwe re wana ji sîyasetmedaran re veşêrin.
Naxwazim bibihêzim ew dengê kenê derewîn.
Destûra dubeşiya dilên xwe nedin,
Yek li hundir, yê din li derve.
Hewla jiyanek durist bidin her demî,
Bi dilxweşî govendê bi gerin.
Bila dawet ji dawetê zêde ne tiştek be...

Institut kurde de Paris

## II

Ez ne lehengê serjêkirê mirîşkanim,
Weke darên payizê bi min ve hildiweşe dara zavatiyê,
Xwîna mirîşkê ji qirikê diherike serê nikûl,
Di niqûte dilê min.

Dilê
min
diêşe...

Di nava xwelîfiska ber derî de,
Zarok li mewîj û şekir û fêkiyan digerin.
Mezin, mêr û jin pihînan li wan dixin.
Mijang û birûyên wan ji tozê boz dibin.
Rûyên wan bi kenekî bi destxistina şekirekî dixemile,
Belkî jî çend qirûş pere..

Ez jî dixwazim weke we tevan,
Sêva ji darika zavatiyê biavêjim,
Ne li bûka reben lê li serê hinekî din bikeve.
Ez jî weke we tevan derewîn im,
Çima? ...
Ez bi xwe jî nizanim.
Weke we ez jî tirsonekê vê şevê me.
Bûk û herkes jî dizane ku şev ji min re
ne ya yekemîn e.

Institut kurde de Paris

Ewên ku teseliya lehengiya xwe
bi demançeyan dikin,
guleyan weke nêrînên xwe yên qirêj,
bi serê xelkê de dibarînin,

Herkes dizane ku ew tirsonekên roja ku biqewime ne.
Weka sêvan çend caran,
Zarok bi guleyên wan ji serê daran pekiyane.
Dawet û şer tevî hev nekin.
Ne pêwîste ku hûn herdem êş û kêfê bi hev re bijîn.
Di jiyana xwe de carekê jî cîh ji kêfê re vekin.

Ez bi hêvî bûm
ku wê qîmeta min ne bi qewet û zilamtiyê,
ya jinê jî ne bi zêr û jinantiyê be.
Biguman e!!!!
lê em jî weke we tevan tenê şevekê bi qîmet in.

Me xwe amadeyî hevrejîneke
wekhev û azad kiriye.
Emê bi hev re ber bi asoyên nû ve biçin.
Li gor pêdiviyên çaxê bijîn,

Min li ser sendeliyan bilind nekin û
dilê min ji bedena min veneqetînin.
Rewşa mala bûkê jî wê gelek biguhure li cem min.
Ka carekê bila dawet bi dawî bibe,
Weleh ji wan re nema ew
kumkumandina wan.

Ewqas pişta me xwar dikin
bi barên zêdeyî qeweta me.

Weke hev in dîsa dawet,
Li gundan û li bajaran.
Hovîtî li her deveran e, di kirasên cûda de.

Institut kurde de Paris

Dîsa wan ramanên xwe yên genî li min nekin bar.
Na na,
Min ne bexşînin
heger ku îxanetê rêya min birîbe
an jî bibire.
Min nebexşînin, na !!!
Dema ku ez bi xeletiyên salan bijîm...

Institut kurde de Paris

## III

Em baş dizanin ku hûn bi çi çavî ($)  li me dinihêrin.
Mêvanî û dostanî tev pere ye.
Her yek ji me helqekî zincîreke zêr an jî bazinek e.
Çiqas hûn dikarin
derewan binivisînin di dawetnameyan de.
*"şirîkdarê bextewarî û şahiya me bibin!!!!!"*
Hûn jibîr dikin qey rastiyê bibinivêsin:
*"şirîkdarê deyn û dertulên me bibin"*

Zava diponije:
*"Ka evqas deyn ezê çawa eda û safî bikim?"*
Bûk diponije:
*"Wele ev xelk tev bazinan bi min ve bikin!!!"*
Carcar li hev dinihêrin,
Weke ku ramanên hev binirxînin,
dibesimin.
Çavên keç û xortên nezewicî
li bejn û bala wan zoq dibin
Ji gerandina govendê bêhal û bêmecal dimînin.

Berbûrî jî ne hêsane birê min !!!
Ka li kubariya malbat û aliyê bûkê binihêrin.
Dibê qey ji zembîla mala esîlê Frensî ketinê.
Ji nazikî û kubariyê li hev nasekinin.

Institut kurde de Paris

Ji xwe mala zava tu caran ji
deyndariya wan nafilitin.
Dikin û nakin bi dilê bûkê çênabe.
Mirov bi ber bayê wê re diçe.

Wan kesên ku xwe xwaro maro dikin
û di her dawetan de şabaşiyê dikin çavên xelkê.
Na bavo,
ji tara ku me daye we zêde
me pere tune ku bi serê we de bireşînin.
Bila ew kesên ku pere direşînin û berîkvala
didin rêya mala xwe, baş bin,
Bila em ne qenc bin…

*Me dixwest ku em van gazincan hember rûyên*
*we bînin ziman. Lê divêt ku hûn idara tenê xwendina*
*ji çavên me bikin. Ji ber ku gotarên wiha*
*di dawetan de li rûyê bûk û zaveyan nayên gotin.*
*Çi dizanim dibêjin fedi ye, şerm e.*
*Zêdeyî ku çend keç û lawên me*
*hevdu li daweta we nas kirin û hevdu ecibandin*
*zê de me ti xêr ji zewaca we nedîtiye.*
*Xwedê weke firehiya dilê we bide we.*
*Ji ber ku cîh herdem ji dilan teng e...*

Institut kurde de Paris

## Dilhejê

Xwe dihejîne û dihejîne
Bayê wê mirov difirîne
Sondxwarina dawiyê navê wê,
Sal diajo nêrîna bala wê,

Xwe dihewîne û dihewîne,
Di dilan de hêlînevîn e,
Maç bi xezeb, dilperitok,
Lêvên wê ne bêhnbenîştok.

Xwe dilivîne û dilivîne,
Dildayîn bê cîh û livîn e,
Ji sorroja ber ava ye porê wê,
Li dû xwe tovkirine karê wê.

Xwe dinexşîne û dinexşîne,
Li taqên bilind xwe dibexşîne,
Xwe çavgirtî diavêje newalan,
Ser hêvî û xewn û xeyalan.

Xwe dixemilîne û dixemilîne,
Dilive, dibeze li der û devîne,
Liba bûne weke pirpirokan,
Karê wê ji sibe heya êvaran.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

"Şihîra kurdî di warê modernbûnê de, ez bawer im, gelekî qels e. Herçî dengên nû yên keç û jinan in, di wî warî de, şihîra nû hîn qelstir e. Jiber vê yekê ez bi dengê nû yê Bêrî Biharê kêfxweş bûm. Dengê wê bi rastî jî modern e; ew şihîra hest, coş û xemgîniyên keç û jinan dinivîse. Cîhana jinan, zarokan, pêwendiyên dê û zarokên wan, evîn, evîndarî, mijarên şihîra wê ne. Herweha jiyana rojane ya jin û zarokan ku em pirî caran, ji ber aloziyên siyasî, civakî û çandî, ji bîr dikin."

(...)

"Ez bawer im, ev rêzên jêrîn nîşan dide ku eger Bêrî Bihar dewam bike, em ê bibin xwediyê dengekî nû yê modern;

Tenê lingên min dizanin ku,
Heya niha, çend gav, çend pêpêlek,
Çend dûvreşopîn kêm bûne
Ji derenca jiyana min..."

**Mehmed Uzun**

"Bêrî Bihar di helbestên xwe de wêneyên gelek balkêş û rengîn diafirîne û şanî me dide; me bi xwe re dibe cîhana nîgaş û xeyalan, hin caran me dibe binê deryayên kûr, kişwerên hût û masiyan û hin caran me dibe lûtkeya çiyayên bilind, zozanên asê, warê hêlînên şahînan û fêza pezkoviyan, û me dîsa dadixe hafa gelî û newalên kûr, ber kunên maran û nêziya lanên cînewerên hov. Em bi Bêriyê re, di vê gera xwe de her dem di nava liv û tevgerê de ne, em her dem dîmenên nû dibînin û dibin xwedî serboriyên nû; mîna gera li çar kenarên welatê me, gera li nav sirûşta bedew, deşt û zozan, dehl û çiya, zevî û beyar, lat û zinar, çem û robar, gund û bajaran..."

**Mustefa Reşîd**

ISBN 907714003-4

Institut kurde de Paris

KL